

# DIBISTANA BÜRGERBUSCHÊ

## **Dê û Bavên hêja!**

Hûn îro cara pêşiyê ku zanyariyan di sala nû de ya dibistanê 2015/16 distînin. Em dixwazin ji we re bi vê, bûyeran, erkên giring, qewldanîn (dem kivşkirin) û niyetên xwe bêjin û li ser agahdariyan bidin we.

Emê gellekî kêyfxweş bibin ku bi we re di sala nû de kar bikin û vê pêşve bibin.

Evyek ji aliyê hemû mamostan û xebatkarin dibistana Bürgerbuschê ve ye.

## **Dibistana bi Temamê Rojê û Dersên Piştî Nîvro**

Dibistana Bürgerbuschê ya tamamê rojê ye. Em bernameyêke rengî û dewlemend pêşkeşî we dikin. Hûn timî di destpêka salê de bernama nivêsalê ya dibistanê digrin, hûn dikarin bi vê bi zarokên xwe re qurs û AG (karên hevbeş kirinê) bi hev re bijêrin.

Roja sêşemê piştî nîvro hemû şagirt berpirsiyar in (mecbûr in). Zêde jî pêwîst e yekê din jî bê bijardin (wek AG-karê hevbeş, Firma şagirtan). Dersa piştî nîvro ji duşemê heta pêncşemê ye. Ev saet 14.00 û dawî saet 15.30 ye.

## **ALÛKRIYA DERSÊN MALÊ**

Dersa malê û dema hînbûna dersan, ev jiyana dibistana me ye û ev pêwîst e bîr amedekirin. Wek alîkarî û amedekariya van dersên malê, roja duşem, çarşem û pêncşemê di dibistanê de tên kirin. Ji 13.15 heta 14.00 nêhîrtin û piştîkariya dersan bi wan re mamoste dikin.

## **Rêya Dibistanê di Zivistanê de/ di Seqa û Sermayê de Rêkûpêkî (qayide)**

Bi taybetî ev ji niha ve girîng di demsala tariyê de ku zarok serê sibê di rê de ku ew baş bîr dîtin. Pêwîste lempa bisiklê bîr kontrolkirin.

Ji kerema xwe basiklê baş binêrin û cilên ku di tariyê de baş tên dîtin bila lixwebikin.

Eger di şevê de berf gellek hat û rê û soqaq cemidî, qerisî, dezgaha parastinê (Feuerwehr) ya ji tehlikan (xeteran, wek ji agir, hawa, seqa), an jî polîsan û VWG binêrin ka wek her demê dibistan heye an jî na yanî xeter e ku hûn wisa wan bişînin (nimra telefone li jêr e).

Şaredariya bajêr bi rêya radiyo, medyên din wek malpela internetê ê we li ser vîdeyo zaniyar bike (îlan dike), dibe ku saeta dersan ya 3. Şagirt (zarok) pêwîst e xwe bidin xuyakirin.

Ji kerema xwe radiyo guhdarî bikin dema rê û soqaq qerisî bin telefon bikin.

ServiceCenter ya bajêr ev nimreyê:  
2354444 telefon bikin.

## **Di Dibistanê de Taştê û Xwarina Nîvro**

Ji roja duşemê heta pêncşemê zaroka we dikare di navbera yekemin de li dikana dibistanê dikare ji xwe re xwarin û vexwarin bikire. Roja îne "Oldenburg Tafel" ji me re tastê belaş dişîne dibistanê.

Saet 13.10 virde ji rojên duşeman heta sêşman xwarina germ bi 2€ heye, jin û sinifa (pola)7. Teze amade dikin. Caterer nû ji me re rojên çarşeman û pêncşeman xwarina teze bi 2,85 € dişîne. Kî alîkarî digire, wê xwarina nîvro bi 1 € bistîne.

Zaroka we dikare, ji bo heftiyekê roja pêncşemê ji mamostê xwe yê sinifê pûlê xwarinê (markên xwarinê) bikire. Hûn dikarin pêşî ji bo gellek heftiyên jî pere (dirav) bidin.

Mitfaza (ciyê xwarinê) me ji aliyê "Daîra Zetrala Xerckirinê" ve bi stêrk hatiye nîşandan. Em li ser xwarinên qalîte disekin û bi cî dikin. Em xwarinên nû datînin, yê kevn û kelûpêlên din li dibistanê qedexeye.

## **Meywên Dibistanê**

Hemû sinifên 4-6 tevî vê projê dibin. Ew heftiyê 3 caran bêpere (bêdirav) distînin. Meywên BIO (xwezayî) û sebze ji rêvebirên bajêr ve tên standin.

## **Hînbûna Civatê (Sosyal)**

Em gellek li ser tiştên hêja, qîmet û baş ve li derûdora xwe dinêrin û bi hev re hevaltiyê dikin. Ji bo ku em bigîhîjên van armancan, em bi gellek saziyan re bi taybetî tîma alîkarên gencan (Jugendhilfe) re bi hev re kar dikin. Serde jî evin ku zarokan aciz û bi tenê dihîle (mobbing- xwe bi tenê dibînin) û ji nav xwe dûr dikin, bi wan kesan re her roja îne dersa 6. Saetek şîretan li wan dikin mijarê lidardixin.

Ji bo hemû sinifên 7. re du rojan ku ew karibin di warê civatê de xurt bibin, qurs heye. Bernama ku "Em xurt in" bijin, wek naskirina sinifan û rêya ku bi hev re qewet bibin û fonksiyona wan (tesîra wan) çêbibe. Ev qurs (devre) bi polîsên ku şîretkarî didin û ew bi hev re devrê datînin û kivrê dikin.

## **Xizmeta Tenduristiya (Saxî) Dibistanê**

Şagirtan di 2 rojan de ji bo alîkariya pêşî ya tenduristiya bi Xaça Sor e Alman re kar kirin û hatine perwerdekirin. Jixeynê vê bi xizmetkarên tenduristiya yê dibistanê re odeke teybetî û nû ya ji bo tenduristiya (saxiyê) tekûz û bi cî dikin.

## **Danîna Qewlan(demê)**

Belgên Notan ya Şagirtan ya nivêsalê  
27.01.16

Ji bo Dibistanê Civina Perwerdeyeke Qalîte bi Mamostan re  
04.04.16

Dawiya Îmtihanê ya Ji Bo Bêşa Almanî  
25.04.16

Temamê Konferansê/Birêvebirên Dibistanê  
03.05.16

Dawiya Îmtihanê ya Ji Bo Bêşa Matematikê  
03.05.16

Îmtihanên Devkî  
30.05.16 heta 03.06.16

## **Pirs, Şîret û Alîkarî**

Dema ku pirsên we hebin, hûn dikarin serî Xanima Brokop û Xanima Schmidt xin li ciyê ofîsa sekreteran de. Her roj saet ji 8.00 heta 12.00. Hûn dikarin telefone vê nimrê bikin.

Tel. 0441/302537

Gellek agahdariyên fireh û qewlan(dem kivşkirin), hûn dikarin li ser hompeca me bibînin.

Ev e: [www.schule-am-buergerbusch.de](http://www.schule-am-buergerbusch.de)

E-Mail: [info@schule-am-buergerbusch.de](mailto:info@schule-am-buergerbusch.de)

## Betlane (tatîl- azadanî)

Betlana Belga Notan  
28.01.16 – 29.01.16

Betlana Biharê (Osterferien)  
18.03.16 – 04.04.16 (!)

Himmelfahrt  
05.05.16 – 06.05.16

Betlana Pfingsten(Pfingstferien)  
16.05.16 – 17.05.16

Betlana Havînê  
23.06.16 – 03.08.16

**Mafê we heye? Ji kerema xwe erzûhaleke nû bidin ciyê Jobcenter anjî Sozialamtê(Daira Sosyalê) li ser perwerdeyî û tevlîbûna pakêtê (BUT) .**

Dibistana Bürgerbusch  
Eßkamp 126\* 26127 Oldenburg  
Fon(Tel): 0441/30 25 37\* Faks: 0441/ 30 47 870  
Email: [info@schule-am-buergerbusch.de](mailto:info@schule-am-buergerbusch.de)

Ahmet Akbaş